Kurdistan

PDK-S Partiya Demokrata Kurdistan - Sûriya 1957

Rojnameyek ji aliyê ragihandina navendî ya PDK-Sê ve tê weşandin

Çirya Paşîn / 1 - 11 - 2019 Kurdistan-Hejmar (160) www.pdk-s.com

# Hebûna Kurdan di komîteya destûr de giring e, û divê piştevaniya nûnerên Kurd were kirin

Kurdistan Diyar Remedan



Civîna komîteya destûrê Sûriyê li Cinêvê destpê dike. di nava wê komîteyê de hejmarek ji endamên Kurd hene ku nûneratiya gelê Kurd li Kurdistana Sûriyê dikin. Berya niha jî Geir Pedersen tekez kir jî. Nûnerê Kurdan û hemû pêkhateyên din ên Sûriyê di Komîta Destûrê de beşdar in. Ji aliyê xwe ve jî rêveberîya Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD di daxuyanîyekê de raghandîye. ew derencamên civînên komîteya destûra Sûriyê dê red bikin jiber ku ti nûnerên wan di nav wê komîteyê de nîne.Li ser mijara Komîteya destûrê Sûriyê rojnameya Kurdistan nerîna çend welatiyan stand. Welat Ehmed dibêje hin têbîniyên wan li ser vê komîteyê heye. lê nûnerên Encûmena Niştîmaniya Kurdî nûneratiya wan dikin û ew bi hemû karînên xwe piştevaniya wan dikin. bila ti kes jî behsa vekişandina wan ji vê komîteyê jî neke ji ber ku e yek bi xwe destkefteke mezin e. lewma dive piştevanî were kirin. Ilham Hesen jî wiha dibêje. PYD her car xwe dikuje ku endamekî wê di nava civînên ku li cinêv dibin hebe. lê ew yek naçe serî. niha ew dibêje nûnerê Kurdan nine. lê berûvajî vê yekê nûner hene. lê ne di wê asta ku em dixwazin. raste hejmar kêm e. lê bi vê rêjeyê hate erêkirin. lê dive nûnerê Kurdan dengê gelê xwe bin. û ji berjewendiyên partîtî dûr bikin. û piştevanî û berevaniyê di ber doza Kurd li Kurdistana Sûriyê de bikin. hebûna Kurdan di komîteya destûr de gelekî giring e.

# Kurdên Kurdistana Sûriyê ketine nava bazarên cîhanî de

Kurdistan- Siyamend Ebdulah

Serokê Rûsyayê Vladimir Putin û Serokomarê Tirkiyê Recep Teyip Erdogan rêkeftinek derbarê Rojavayê Kurdistanê de îmze kirin. Li gor rêkeftinê. Rûsya Polîsên Leşkerî yên Rûsî li Rojavayê Kurdistanê belav dike. bi Tirkiyê re gerên hevbeş jî dikin û rêkeftina Edeneyê bicih dikin. Xalên têgihîştina (rêkeftina) Putin û Erdogan:
1- Herdu welat tekeziyê li ser yekperçeyîya xaka Sûriyê û parastina ewlehiya netewî ya Tirkiyê dikin.2- Herdu alî rûbirbûyî terorê dibin û hemû projeyên perçekirina xaka Sûriyê dikin.3- Di vê çarçovê de. rewşa niha ya ji encama operasyona Tirkiyê herêma ji Girê Sipî û ta Serê Kaniyê bi kûrahiya 32 K.M tê parastin.4- Herdu alî tekeziyê li ser rêkeftina Edeneyê dikin. Rûsya dê rê li ber bichkirina wê xweş bike.5- Ji demjimêr 00:00 ji roja 23ê Cotmeha 2019an ve. Polîsa Leşkerî ya Rûsyayê û Pasewanên Sînor yên Sûriyê derbasî ser sînor li navçeya derveyî operasyona Tirkiyê dibin. ji bo hêsankirina vekişîna hêzên YPGê ta 30 K.M dûrî sînor û divê di heyama 150 demjimêran de ev prose bidawî bibe. Ji dema bidawîbûna wê proseyê jî. Rûsya û Tirkiyê gerên hevbeş li aliyê rojava û rojhilatê operasyona Tirkiyê ji bilî bajarê Qamişlo encam didin.6- Hemû hêzên YPGê ligel çekên xwe ji Minbic û Til Rifetê derdikevin.7- Herdu alî rênimayên pêwîst digirin ber. ji bo rêgirtina li derbasbûna teroristan.8- Herdu alî kar bo vegera koçberan bi awayekî ewle û jixweberê dikin.9- Mîkanîzmeke hevbeş bo çavdêrîkirin û lêkolînkirinê pêk tînin. ji bo serperiştiya bicihkirina vê têgihîştinê bike.10- Herdu alî kar ji bo dîtina çareseriyeke siyasî ji krîza Sûriyê re di hundir mîkanîzma Astanayê de dikin û dê piştevaniya çalakiyên Komîta Destûrî bikin.



Ev rêkeftin niha wek ku diyar dibe ketiye warê cîbicîkirinêm û Rûsiya polîsên leşkerî di navbera Qamişlo heta bi nêzîkî Serêkaniyê ve digerîne. lê pirs ew e gelo dê Tirkiyê vê yekê ji Rûsiyê Qebûl bike. û dê HSD ku PKKê wê birêve dibe bi mercên Rûsiya razî be. Mihemed El-Elî wiha di vê derbarê de dibêje: Rêkeftina Rûsiya û Tirkiyê ya derbarê Rojavayê Kurdistanê heta radeyekê ji bo mabûna xelkê deverê û ne koçberbûna wan baş e. lê heta çi radeyê dê PKKê vê yekê qebûl bike. ji ber ku ev partî dixwaze Kurd bi tevahî koçber bibin û şerekî mezin rû bide ji ber ku ew sûdê jê dibîne û temenê wê pê dirêj dibe. Divê her yek ji rejîma Esed û Rûsiyê rewşa deverê li ber çav bigre û tola sala 2011an hilneyne. û tirsa xelkê ji wê yekê ye ji ber ku dê her kes ji deverê baze û berê xwe bide penaberiyê.

Selam Xelef jî wiha di vê derbarê de dibêje: Em nabêjin rêkeftina Rûsiya û Tirkiyê başe. lê Rûsiya heger kete deverê bi fermî rê nade ku Tirkiyê êrîşê bike û dê berevaniyê di ber wê deverê de bike. helbet heger ne Rûsiya ba dê Sûriyê ji zû ve ketiba destê opozîsyonê de. Rûsiya ji Amerîka bêhtir bi wefatir e. lewma divê di vê demê de Encûmena Niştîmmaniya Kurdî berê xwe bide Rûsiya û pêwendiyên xwe yên dîplomasî bikar bîne daku vê rewşê aram bike û rê li ber êrîşên Tirkiyê were girtin.

Helbet vegera rejîma Esed jî dê bandoreke zêde li ser ciwanan bike. ji ber ku piraniya wan leşkeriya rejîmê nekirine.

Wezareta Berevaniyê ya Rûsyayê ragihand. bi pasewantiya hêzên Amerîkî. petrola Sûriyê bo derveyî wî welatî tê veguhastin.

Wezareta Berevaniyê ya Rûsyayê wêneyên heyva destkird belav kir û got: "Wêneya karwana tenkerên petrolê ji Sûriyê derdikeve derveyî wî welatî".Peyvdarê Wezareta Berevaniyê ya Rûsyayê Lîwa Igor konashenkov li ser wan wêneyan got: "Wêneyên îstixbarata esmanî ya Rûsyayê nîşan didin. ku berî û piştî jinavbirina DAIŞê. petrola Sûriyê di bin pasewantiya tund a hêzên Amerîkî de bi tankeran ji rojhilatê Firatî derdiketin derveyî Sûriyê."

Wezareta Berevaniyê ya Rûsyayê wêneyên di meha Îlona bûrî bi riya heyva destkird hatine girtin belav kir û got: Di wêneyan de û nîşan dibe ku tankerên petrolê di bin parastina hêz û kampanyayên Amerîkî de derdikevin derveyî Sûriyê. Iigor konashenkov dibêje: Tiştê Washington dike ew e. petrolê ji kêlgehên li rojhilatê Sûriyê didize. Ev jî li dijî yasayên navdewletî û yasayên Amerîka ye. Wezareta Berevaniyê ya Rûsyayê dibêje: "Tiştê dibe. talaniya li ser astê dewletan e."Tekez kir jî. "Kanzeyên di bin xaka Sûriyê de. yên Sûriyê ne û yên terorist û pasewantiya Amerîka ne."




Li ser vê mijarê Mihemed Mehmûd jî wiha dibêje. Amerîka dibêje ewê li deverên petrolê bimînin. û dê parastina wan bîrên petrolê bikin da ku nekeve destê DAIŞê de. û ev yek tê wateya wê yekê ku armanca Amerîka eşkere bûye. û wek çawa rejîmê PYD û çekdarên ser bi wê ve wek pasewanên petrolê danîbû niha Amerîka jî wiha wan bikar tîne. Amerîka dibêje ku çekdarên ser bi PYDê ve bi pereyên xwe şer kirine û wan ji bo şer kiriye. me hertim digot PYD li pey destkeftên siyasî nagere û tenê li pey pereyan digre û ev siyaset ya Partiya Karkerên Kurdistanê PKKê ye. lewma divê êdî karê dîplomasî û siyasî were kirin da ku gelê me ji vê pirsgirêkê rizgar bibe û êdî nema aware bibe.

# Her ku diçe hejmara penaberên kampa Berdereş zêde dibe

Raid Mihemed- Hewlêr




Di 14ê meha bûrî de. kampeke nû hat vekirin li parêzgeha Duhokê li Qezaya Berdereş. ji bo penaberên Kurdistana Sûriya ku ji wan deverê ku Şer rûdabû reviyabûn. ji ber ku Dewleta Tirk û Hevalbendên wê ji Tîroristên Opozisiyona Sûriya êrîşî Devera Kurdî kirin bi rengekî hovane û jiyana welatiyan kete metirsiyê de. ji ber vê yekê Hikûmeta Herêma Kurdistanê biryar da ku Sînor ji wan kesan re veke. û wan li cihekî aram akancî bike . ev yek hat piştî Dezgeha Xêrxwazî ya Barzanî di dest pêka Şer Nêzîkî 35 Ton pêdiviyên Xwarinê û Tenduristiyê ji Kurdistana Sûriya re şiyand û radestî Heyva Sor a kurdî kir ji bo alîkariya wan kesê ku dev ji gund û bajarokê xwe berdan ji Serê Kaniyê û Dirbêsiyê û Girê Spî û berê xwe dane Qamişlo û Hisiça. berpirsekî Dezgeha Xêrxwazî ya Barzanî ji Rojnameya me re got ku Dezgeha Xêrxwazî ya Barzanî li Ser Sînorê navbera Herêma Kurdistanê û Kurdistana Sûriya rawestî û pêşwaziya penaberan dikir û di riya Kosterên taybet ew penaber hatin veguhestin ji bo kampa Berdereş ê ya ku berî niha ni penaberên Deşta Mûsilê vala bûbû. ku her roj ji 14ê Cotmehê Nêzîkî 1000 kes derbas dibû çarna bihtir û carna kêmtir. heta roja 25ê Cotmeha 2019an ku ew kampe hat dagirtin û hejmara penaberan li kampakampa Berdereş gihişte 11347 kes. ji bo ew li Ser rewşa wan rawestin û bihtir nas bikin me hin lêdwan û hevdîtin kirin . kak Şadman berpirsê xwarinê bû li kampa Berdereş ji me re got :" em 3 jemê xwarinê didin penaberan bi rengekî lezgîn. û Rêxistina UNHCR kon li Ser penaberan belav dikir. û Rêxistina Qendîl Doşek û Betanî li ser wan belav dikir. û Rêxistina WFP Xwarina hişik dida wan". Bavê Ehmed li gel hevjîna xwe û 4 zarokên xwe ku temenê wan ji 1 salî heta 12 salî gihişte kampê ku di Koster ji Sînor ew anîn kampê. bi rewşeke nexweş û dilekî şikestî ji me re axifî û got:" em ji Serê Kaniyê revîn. artêşa Tirkan û çekdarên Opozisiyona Sûrî êrîşî me kirin. em ji tirsa kuştinê revîn . em nizanin ev çi ji me dixwazin. me tiştek ji wan ne kiriye. Dewleta Tirk dijminê gelê me ye. her dixwaze me tune bike. ez spasiya Herêma Kurdistanê dikim û spasîke mezin ji Dezgeha Xêrxwazî ya Barzanî ji ber vê alîkariyê ku bi barê me rabûn. lê rewşa me xirab e. Zivistan li ber derî ye û stara me nîne tenê konekî ji çadir e ". Ji rexê xwe ve Ciwanek bi navê Raman Elî ji devera Dirbêsiyê li gel birayê xwe ji Rojnameya me re axifî û got:" Metirsî li Ser Jiyana me hebû . ji ber vê yekê em revîn. malbatê me li Ser me ditirsin. dilê min bi dayik û bavê min maye. ew dev ji mala xwe bernadin. gelek kes bi me dilîzin. ta Qaçaxçî jî Bazirganê Cengê pereyên gelek ji me standin heta me xwe xilas kir û me sînor derbas kir. min û birayê xwe Nêzîkî 1000 dolar daye Qaçaxçiyan ji bo me bighînin Sînorê Herêma Kurdistanê û ji mere gotin winê nîv demjimêrê bi peyade bi rêkevin heta hûn bigihin Herêma Kurdistanê. lê wan Derew li me kirin. em 3 Demjimêr û nîv peyade di rêde man. ev tiştek pir xirab e. em ji malê xwe revîne û ev Bazirganê bi me dikin. mixabin em jî neçarin ". Diya Yûsif dayika 6 zaroka ye. di dest pêka ku kampa Berdereş hate Damezrandin hat û Rojnameya me re axifî û got:" em bi rêketin me nizanîbû berê me diçe kû. em hatin Kampa Berdereş. Dezgeha Xêrxwazî ya Barzanî pir alîkariya me kirin. û gelek xelkê deverê û penaberên me yên Kurdistana Sûriya ku berî niha hatibûn Herêma Kurdistanê alîkariya me kirin. ji me re alav û pêdivî anîn. ji kampa Kewirgoskê û ya Domîzê û Darşikranê û ji hin kamp û deverên dî . lê Zivistan va tê û em nizanin wê rewşa me çawa bibe di van konan de. em hêvîdarin ji van Dewletan ku Şer ser miletê me yê kurd rawestîinin û em vegerin deverê xwe çî û warê xwe.". Berpirsekî UN ne dixwest em navê wî binvîsin ji me re got ku ew pêşwaziya penaberan dikin û navê wan tomar dikin û rojekê ji her yekî ji wan re terxan dikin ji Formê penaxwaziyê bidin wan . lê hejmar gelek e û hin ji wan pêwîste 30 rojî bimînin heta sira wan were ". Di dema mirov penaber dibe dilê wî dişke û hêviyê wî kêm dibe. wiha me li Ser Rûyê penaberên Kampa Berdereş dixwend. hêviya wan ku ew Şer bi temamî were rawestandin. û kurd yek dest bin û rêveberiya devera xwe bikin. û her kes vegere li Ser milk û malê xwe bi serbilindayî.



# Berderş. Gewîlan


## navnîşana êşeke nû bê sarêj



Idrîs Hiso-Berdereş

Vê sibehê wek gelek rojan. berî roj hilê. ez derketim min got ez dê hinekî bipeyim (Bimeşim) Min dît ku hejmarek barhilgir(kamiyon) û hejmarek beldozer li Gewîlanê kar dikin. erdê rast dikin û axê li serhev li deverên destnîşankirî kom dikin. Amajeya nexêrê ye. careke din wê penaber li vê deverê biciîbibin. Di sala 2013an de yekemîn car penaberên Rojavayê Kurdistanê li heman cî. li Gewîlan hatibûn niştecîkirin. Ji 01.10.2013an. di heman roja ku penaber ji yarîgeha Berdereş ji bo kampa Gewîlan hatin veguheztin. min jî dest bikarê xwe wek birîpêçan li Gewîlanê li nav penaberan bi rêxstina Nûjadarên Bê Sînor a navdewletî destpêkir. Ji nişkêve mirov her tiştî ji dest dide û dibe mêhvanê konekî. lewma rastî rewşeke derûnî pir xirab dibe. ti nirx ji mirovahiyê re namîne. Hûn dizanin çi ye heger mirovek ji hemû reh û damarên xwe. ji mala xwe. ji xaniyê xwe. ji welat. gund û bajarê xwe û bîranîn û hevalên xwe dûr bikeve. bi kêlîkekê bibe penaber û di konekî de rûnê. ne wî ji serma Zivstanê û ne jî ji Germa havînê diparêze. ne jî mişk û maran ji wî dûrbixe? Wê demê dîsa wek ku îro li kapma Berderş dibe. û sibe dê careke din li Gewîlanê bibe. Kes nizane derdê mirovekî demak di tabûrekê direj de ku ji dehên mirovan pêkhatiye. radiweste û misînê avê di destê wî de ye da ku biçe destava xwe biqedîne. an jî pariyek nan bidestbixe. jin û mêr bi mehan divî halî de man. Vê sibehê bi dîtina van beldozer û kamyonan ku amadekariyên pêşwaziya penaberan dikin. hemû wêneyê sala 2013 an hatib ber çavên min. Şerpezeya di konan de serê wê Zivistanê. zarokên di nav şil û şepelyê de. serma. germa. şewitandina konan û şehîdbûna Samir Hiso wek yekemîn penaber ku di encama şewata konekî de şehîd bû. Min qet nedixwest ku careke din ew tiracîdiye dûdbare bibe. min qet nedixwest careke din zarokekî di wî halî de bibînim. Careke din ji bo terorîstên Tirk û Çeteyên Islamî tundirew aştiye xwe pêk bînin çemê xwîna me dirjînin. xwedêgiravî operasyona Kaniya Aştiyê li Rojavayê Kurdistanê dikin. lê wan miletek bi serêxwe koçber û aware kirin. Careke din li serê vê Zivistanê kerwanê koçberiya Kurdan. li ber çavê hemû cîhanê destpêkir. tu dibêje qey qedera Kurdan e. ku berdewam koçber û penaber bibin û malên wan werin dagîrkirin. Careke din qirkirinek bi sere Kurdan tê. piştî ku Kurdan cîhan ji terora DAIŞê rizgar kir. niha jî ji mal û welatê xwe koçber dibin. malên wan tallan dibe. xaniyên wan dişewitin û dibin mêhvanê konekî. bê av û bê Kehrebe. Rojane karwanên awareyên Rojavayên Kurdistanê bi taybet xelkên Serê Kaniyê ber bi Başûrê Kurdsitanê ve tên. rûmest in. dilxemgîn in lê di çavên wan heêviyek heye. mirov dikare bi hesanî bixwîne. hêviyan ew e ku vê care cîhan û zilhêz wan di nav êş azarên wan de nehêlin. û wijdanê zilhêzan tevbigere û jib o parastina wan çareseriyekî li ser axa welatê wan bibînin. Lê xweska îro çavên min ji xewê şiyar nebûna û tiştê ku min li Gewîlan û Berderş dît min nedîtiba.





# Dayê

**Hesn Xalid**

min ji hembêza xwe dûr neke ...
Ne her sing têne hizrêt min - dayê ...
di kelkela barîna ...
berf û baranê de ...
bi sincirandina hilma te ...
ji xew şiyar di bim bi xweşî ...
mîna hilma zagrosê ...
di payîze de ...
germiyeke ji rondikê ...
rojê belav bike - dayê ...
di wê dem salê de ...
ti der ji hembêza te ...
xweş û germ tir tune ye ...
dayê ...
**dayê ezê di nav ...
xewnê xwe de ...
germiyê vexum ...
vekişênim ...
di valehiya asîmanê şîn de ...
di hev beşiy ewra de ...
di rûbaran de ...
germiyê vexum ...
bihogir û dostan re ...
tenê dostê minin ...
tiving û zinar ...
û ramanên saxin ...
tenê ewin xwedî bawerî ...
dema her kes ...
me pişt guh ne ke - dayê ...
de min ji wê hembêza dûr ne ...
* her tuyî kanî ...
di tîbûna min de ...
tuyî dexl û dan ...
di birçîbûna min de ...
dayê ...
Tim / dest vekirî / ...
bê pirs û buha ...
bê gazî - dayê ...
dest û sing û hembêz ...
de hilma xwe belav ke ...
ew bi xwe ye nîşana ku...
pê ser xwe ve bi bim ...
piştî windabûneke ...
bê dawî û bê wate ...
dayîka bedew ...?!!

# Kurdên Elmaniya piştevaniya Kurdistana Sûriyê dikin

Hîn Xelîl-Elmanya

Her ku diçe nerazîbûn û xwepêşandanên li dijî êrîşa Tirkiyê ser Kurdistana Sûriyê zêde dibin. li bajarên cûda yên welatên Ewropayê. bi hezaran kes dadikevin cadeyan û li dijî êrîşa Tirkiyê derdikevin. Kurdên ji derveyî welat daxwaz dikin kiryarên Tirkiyê li Kurdistana Sûriyê werin rawestandin û çareseriyek ji vê karesta mirovî re were dîtin. Revenda Kurd û hejmarek ji welatiyên Elman li bajarê Schleswig yê Elmaniyayê dijî vê êrîşa ser Kurdistana Sûriyê dengê xwe û wêneyên qurbaniyan bilind kirin. û daxwaz kirin ku ev êrîş were rawestandin û êş û azarên Kurdan nemînin. Kurdên li vî bajarî dimînin dixwazin bi van xwepêşandanan welatên Ewropayê. Tirkiyê neçar bike. ku dawiyê bi vê êrîşê xwe bîne. û êdî ti kareseteke mirovî rû nede. jibilî Kurdan welatiyên Elman jî di vê xwepêşandanê de beşdar bûne. Jineke Elman dibêje ku ew jî bûyerên ku li Kurdistana Sûriyê rû didin şerm dike û hevxemiya xwe jî ji bo qurbaniyan tîne ziman û wiha dibêje:"Ez ji xwe şerm dikim ji ber bûyerên vê dawiyê ku li Kurdistanê rû didin. gelek hevalê min yên Kurd hene û hewil didim alîkariyê bikim. ez behsa tişta ku Emerîka dikie nakim. herwiha bi dil û can ligel qurbaniyên vî şerî me". Xwepêşandanên Revenda Kurd li welatên Ewropayê helbet bandoreke erênî li raya giştî ya cîhanî dike. û dengê gelê Kurd jî dighîne navendên biryarê.û bi vê yekê hem dengê Kurdan dibe yek. hem jî dengê xwe bihev re dighînin cihê mebest.

